The Kurdish Centre of
INTERNATIONAL P E N
A World Association of Writers
NAVENDA PEN A KURD
Kurdisches PEN – Zentrum e.V.

Dr. Zaradachet Hajo, President – Franziuseck 16, D - 28199 Bremen / Germany, Mobile: 00 49 (0) 1773351016
Moustafa Rechid, Vice President – Entenmühlstr. 2, D - 66424 Homburg / Germany, Mobile: 00 49 (0) 17627186964
Berivan Dosky, Secretary – 72 Diamond Road, Ruislip, HA4 0PG / UK, Mobile: 00 44 (0) 7968764617
Mehmet Sahin, Treasurer – Postfach 90 31 70, D - 51124 Köln / Germany, Mobile: 00 49 (0) 1719351171
Kakshar Oremar, Member – Gustav-Poensgen-Str. 37, D - 40215 Düssedorf / Germany, Mobile: 00 49 (0) 17620061534



Sala nû, nexwest rojên xwe derbas bike bê ku giyanekî hêja ji nav me bi xwe re nebe. Bayê mirinê dara jiyana helbestvanê Kurd Yûsivê Berazî "Bêbuhar" bi xwe re bir û derbas bû. Yûsivê Berazî di sala 1931 ê de li gundê Girê Circiyê ku girêdayî devera Elbab çêbû û roniya vê jiyanê dît. Zaroktiyek hejar û perîşan derbas kir û di sala 1947 ê de bi tevî mala xwe berê xwe dan bajarê Minbic ku ew jî girêdayî parêzgeha Helebê ye û di pey re ji wir hatin herêma Cizîrê, bajarê Serê Kaniyê, ku girêdayî parêzgeha Hesekê ye. Ji sala 1956 ê de derbasî nav refên tevgera Kurdî bû û bi dehên caran hate girtin. Li serdema şoreşa Êlûnê, di salekê de 27 caran hate girtin, êdî girtin ji helbestvanekî hestzîz weke Bêbuhar re çi hest dida û çi êş û keser dida? Di 25 saliya xwe de û bi palpiştiya seydayê Reşîdê Kurd hînî giramêra kurdî, tîpên latînî bû û bi palpiştiya seydayê Cegerxwîn hînî melevaniya li nav pêlên deryaya helbestnivîsandinê bû.
Çîroka wî û nivîsandina helbesta Gulîzar gelekî navdare; derbarî vê helbestê wisa digot: "Ez li ser keviya çem rûniştîbûm, pasek dagirtî ji şagirtên dibistanê li wir bû, ji nişkave min dît keçeke kezîzer derket û nêzîk dibe. Min ew hizr kir ku ew keç ji birayên me yên kiristiyan in, lê dema hevala wê bangê kir û got: Gulîzar were em çûn. Êdî çavê min bi Gulîzarê ve daliqandî ma ta li pasa xwe siwar bû, min jî yekser helbesta Gulîzar nivîsand."
Ji bo qedandina jiyana xwe û ji neçarî Bêbuhar bû berber û salonek vekir, vê paşiyê piştî nexweşiya wî û nexweşiya hevsera wî ji bo mesrefa derman û doktoran ew salon firot. Gelek helbestên wî bûne stiran, yên herî navdar bi dengê nemir Mihemed Şêxo belav bûne; gelek dîwanên wî yên belavbûyî û yên hê belav nebûne hene. Ji yên belavbûyî:

1- Zindan/ 1988 2- Bang/1997 3- Raperîn/ 2002 4- Serxwebûn/ 2005
5- Pêşketin/2007

Bêbuhar ji ber nexweşiya werma di mejî de di roja 15.01.2009 ê li bajarê Serê Kaniyê çû ber dilovaniya xwedê. Navenda PEN a Kurd serxwşiyê ji zarok û malbata helbestvanê hêja re dixwaze, ku bêdudilî cihê wî di dilê her kurdê welatperwer de di asta herî bilind de ye û wê ev cih her û her bilind bimîne.
Serê malbata seydayê Bêbuhar û serê gelê Kurd sax be û bihuşta rengîn jê re cih û war be.

Navenda PEN a Kurd
15.01.2009